QULIXKIRINA MEYE PADŞATIYÊ

ADAR 2015

TÊMA VÊ MEHÊ: "Bona Hemû Kirinêd Qenc Hazir Sekinî bin" (Tîto 3:1).

HEFTIYA JI 9 ADARÊ

Kilama 50 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 19, abz. 1-9 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 1 Samûyêl 1-4 (8 deqe)
№ 1: 1 Samûyêl 2:30-36 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Kitêba Pîroz Derheqa Mesîh Çi Pêxembertiyê Dike? (*igw* rûp. 10) (5 deqe)
№ 3: Padşatiya Xwedê Destpêdike Serwêrtiyê Bike, Çaxê Dijminêd Îsa hê Kar Dikin (*td* 20B) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 45
10 deqe: "Bona Hemû Kirinêd Qenc Hazir Sekinî bin". Gotara li ser hîmê têma vê mehê. Bixûne û şêwir bike Metelok 21:5, Tîto 3:1, û 1 Petrûs 3:15. Şiroveke, ku çi cûreyî hazirbûna baş Mesîhiyara karê tîne. Kin binihêre hine parêd ji Civata Qulixiyê, yê ku seva vê mehê ne, û şêwir bike wekî çawa ewana têma vê mehêva girêdayî ne.
10 deqe: Qisekirina Berpirsiyarê Mekteba Dannasînkirinê. Çi dikeve nava şixulêd te? Çawa tu xwe hazir dikî, seva ku her heftî mektebê derbaz kî? Çima ewêd ku dersa distînin, gerekê rind hazir bin? Çi kar xûşk-bira wê bistînin, hergê pêşda têmê dixûnin û xwe hazir dikin?
10 deqe: "Tu Hazirî seva Êvara Bîranînê?" Şêwirkirin. Kin xeber de derheqa elametiya ji "Qulixkirina Meye Padşatiyê", ya meha Adarê sala 2013, ya ku li ser rûpêla 2-ye (ru). Temaşê nîşan ke, kîderê ku qulixkar silav dike wan mêvana, yê ku hatine ser Êvara Bîranînê.
Kilama 8 û Duakirin

Tu Hazirî seva Êvara Bîranînê?

Ev yek sala 33, 13 Nîsanê D.M.-da qewimî. Îsa zanibû wekî ew êvara paşin e, û ew tevî şagirtêd xweye nêzîk top bû. Ew gerekê cara paşin tevî wan Cejina Nanê Şkeva derbaz kira, û cejina teze jî kifş ke, dêmek Êvara Bîranîna Xudan. Hemikî seva qewimandina usa ferz, hazirbûn lazim bû. Lema jî Îsa şagirtêd xwe Petrûs û Yûhenna dişîne, wekî ewana bona vê yekê hine tişta hazir kin (Lûqa 22:7-13). Anegorî vê yekê, Mesîhiyêd ku Êvara Bîranînê her sal derbaz dikin, gerekê rind xwe seva vê qewimandinê hazir kin (Lûqa 22:19). Çi hine tişt em gerekê bikin, seva ku hazir bin bona Êvara Bîranînê, ya ku wê 3 Nîsanê derbaz be?

Hazirbûna Rûspiya:

- Hergê seva vê qewimandinê hûnê Oda Civatê, yan jî avayê din bidine xebatê, hingê gerekê pêşda evê yekê safî kin. Li wir gerekê êpêce cî seva her kesa hebe, usa jî şewq û vîntîlasiya baş hebe. Ciyê derbazkirina vê qewimandinê gerekê pêşda bê hazirkirinê û temizkirinê.
- Seva gotarê, xebervanê cêribandî bijbêre, usa jî berpirsiyarê bernamê û birêd ku pêşiya derbazkirina sîmbola wê dua bikin.
- Hergê di avayîda çend bernama derbaz dibin, hingê kifş ke ew wede wekî kengê gerekê bikevine avayê û ji wî derên, usa jî xem kin derheqa ciyê sekinandina avta.
- Bijbêre wan bira yêd ku wê seva belakirina sîmbola cabdar bin, usa jî mêvana derbaz kin ciyê wan.
- Pêşda hazir ke sîmbola, tevaxa, îsteganêd seva şeravê, û sifra layîq seva vê qewimandinê.

Hazirbûna Qulixkara:

- Bi temamî di kampaniya Êvara Bîranînêda kar bikin.
- Xwera binivîsin derheqa wan meriva tevî kîjana ku hînkirina Kitêba Pîroz derbaz dikin, bira-pizmama, hevala, heval-xebatkara û nasêd din, seva ku wana teglîf kin.
- Bixûnin û dişirmîş bin li ser xwendina rêzêd Kitêba Pîroz wedê Êvara Bîranînê.
- Were li ser Êvara Bîranînê û hazir be silav kî hemû merivêd ku tên.

 © Wachtturm Bibel- und Traktat-Gesellschaft der Zeugen Jehovas, e.V., Selters/Taunus

HEFTIYA JI 16 ADARÊ

Kilama 26 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 19, abz. 10-17 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 1 Samûyêl 5-9 (8 deqe)
№ 1: 1 Samûyêl 6:10-21 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Serhatî 98 (*my*) (5 deqe)
№ 3: Pêxembertiyêd ku li ser Îsa Hatine Sêrî (*igw* rûp. 11) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 44
10 deqe: Ewana Hazir bûn Derbazî Welatê Taywanê bin. Şêwirkirin li ser hîmê gotara ji "Birca Qerewiliyê", 15 Cotmehê sala 2014, rûpêlêd 3-6 (ru). Çawa ew qulixkarêd, derheqa kîjana ku di vê gotarêda tê gilîkirinê, hazir bûn seva ku derbazî welatê din bin? Çi kerem wana sitand?
20 deqe: "Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Bixebite ku Dayîna Jûrnala Kêrhatî be". Şêwirkirin. Paşî şêwirkirina gotarê, temaşa kin nîşan ke, kîderê ku qulixkar nîşan dike wekî çawa destpêdike hînkirina Kitêba Pîroz tevî wî merivî, kîjanîra ku jûrnala dihîşt. Paşê qisekirinê hilde ji wî qulixkarî, cem kîjanî ku dayîna jûrnala heye. Çiqas meriyara ew jûrnala dihêle? Çawa ew seva her serlêdanekê xwe hazir dike? Bêje wî qulixkarî wekî hine qewimandinêd baş gilî ke.
Kilama 10 û Duakirin

Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Bixebite ku Dayîna Jûrnala Kêrhatî be

Ev Yek Çira Ferz e: Gelek meriv naxwazin Kitêba Pîroz hîn bin, lê wana xweş tê jûrnalêd me bixûnin. Dibeke rêlîgiya wan, wana xweş tê, yan jî ewana dişirmîş dibin ku wedê wan seva hînbûnê tune. Xêncî wê yekê çaxê ew meriv her gav jûrnalêd me dixûnin, hingê ewana dikarin xwestina xwe hindava Xebera Xwedê hê mezin kin (1 Pet. 2:2). Hine gotarêd ji edebyetêd me dikarin dilê wan bigirin, yan jî derecêd wan dikarin bêne guhastinê. Çaxê em her gav serlêdanêd kin wanara dikin, ji bo wê yekê ewana hindava meda halixweş dibin. Û ew yek alî me jî dike pêbihesin hela çi wana xweş tê û seva çi berxwe dikevin. Wede şûnda emê bikaribin tevî vî merivî hînkirina Kitêba Pîroz destpê kin.

Çawa Bikin:

- Her meh wedê xwe usa saz ke ku bikaribî wî merivîra bînî neşirkirinêd teze ya "Birca Qerewiliyê" û "Hişyar Bin!". Dibeke nava mehêda tuyê bikaribî wedekî dinda jî bêyî cem wî merivî, seva ku xwestina wî mezin kî wekî ew bixûne wan jûrnala ku te wîra hîşt. Tu usa jî dikarî bihêlî wan edebiyeta ku wê mehêda têne belakirinê. Nivîsarêd rind seva xwe bike. (Binihêre "Qulixkirna Meye Padşatiyê", ya meha Çileyê sala 2014, rûp. 3).
- Seva her serlêdana xwe hazir ke. Dewsa ku tenê jûrnala bidî xweyê malê, usa bike wekî ew tevî te bikeve xeberdanê. Û bixebite ku heleqetiya baş tevî xweyê malê çêkî, ku bikaribî hewasa wî pêşda bînî.
- Serwaxt be wekî bikaribî mecala bidî xebatê seva ku hînkirina Kitêba Pîroz destpêkî. Hergê kesek ji wan meriya kîjanara ku tu jûrnala dihêlî, dixwaze pêbihese, wekî çi dibêje Kitêba Pîroz derheqa pirsekî, hingê dikarî wîra bînî edebiyeta seva hînbûnê kîderê ku caba pirsa vî tê dayînê. Usa jî dikarin tevayî şêwir bikin. Pêşiya ku herî, pirsekî dayîne ku xeberdana weva girêdayî ye, seva ku careke mayîn şêwir kî. Hergê tu her gav tevî xweyê malê şêwir dikî derheqa têmekê ji Kitêba Pîroz yan edebyetêd seva hînbûnê didî xebatê, dêmek tu îda derbaz dikî hînkirina Kitêba Pîroz. Te xweyê malêra hîşt broşûra "Mizgîniya Xwedê seva Meriya" û nîşan kir ça derbaz dibe hînkirina Kitêba Pîroz? Te wîra nîşan kir vîdêoyêd "Çira Hîn bin Kitêba Pîroz?" û "Ça Derbaz Dibe Hînbûna Kitêba Pîroz?" Hergê xweyê malê serê-sêrîda qebûl nekir Kitêba Pîroz hînbe, ew dikare nihêrandina xwe biguhêze, çimkî derece tê guhastinê. Dibeke wê baş be hergê tu dîsa carekê bêjî wekî tevî wî hînkirina Kitêba Pîroz destpêkî?

Evê Yekê vê Mehêda Bide Xebatê:

- Xwera kifş ke û binvîse derheqa wan meriya kîjanara ku tu dikarî jûrnala bihêlî. Wanara bide jûrnalêd teze û bêje ku careke mayîn tê dîsa jûrnalêd din bînî.

© 2015 Christian Congregation of Jehovah's Witnesses.
Druck und Verlag: Wachtturm, Selters/Ts. Printed in Germany

HEFTIYA JI 23 ADARÊ

Kilama 48 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
bh Serê 19, abz. 18-23 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 1 Samûyêl 10-13 (8 deqe)
№ 1: 1 Samûyêl 11:1-10 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Kitêba Pîroz Derheqa Rojêd Me Çi Pêxembertiyê Dike? (*igw* rûp. 12 abz. 1-4) (5 deqe)
№ 3: Padşatiya Xwedê ne bi Qewata Meriya Pêşda Diçe (*td* 20C) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 20
30 deqe: "Civatêd seva Dannasînkirinê, Karê Tînin". Pirs û cab.
Kilama 32 û Duakirin

Civatêd seva Dannasînkirinê, Karê Tînin

1 Carekê, heta ku herin dannasînkirinê, Îsa tevî 70 şagirtêd xwe top bû (Lûqa 10:1-11). Îsa wana hêlan kir û kire bîra wan ku ewana wê tenê nîbin, çimkî "Xweyê nandirûnê" dêmek Yahowa wê rêberiya wan bikira. Ewî usa jî rêberî da wan, seva ku bikaribin şixulê xwe biqedînin û wana "dudu-dudu" şande dannasînkirinê. Anegorî wê yekê îro jî hene civatêd seva dannasînkirinê mena kîjana ku ew e, wekî hêlan ke, hazir ke û alîkariyê bide me.

2 Niha civatêd seva dannasînkirinê weke 10-15 deqe derbaz dibin, nava kîjana ku dikevin sazkirina qulixkara, kifşkirina têrîtoriyê û duakirin. Niha ev yek wê bê guhastinê. Destpêbûyî ji meha Nîsanê, civatêd seva dannasînkirinê wê 5-7 deqe zêdetir derbaz nebin. Xêncî wê yekê çaxê civata seva dannasînkirinê paşê civatê derbaz dibe, hingê ew civata dannasînkirinê gerekê diha kêm wede bikişîne. Çimkî ewêd ku hazir in li ser wê civatê, îda gelek tiştêd kêrhatî seva xwe ji şêwirkirina rêzêd Kitêba Pîroz hildane. Ji bo vê yekê ku civatêd seva dannasînkirinê wê kêm wede bikişînin, ev yek mecalê dide me wekî hê zêde wede di qulixkirinêda derbaz kin. Xêncî wê yekê hergê pêşeng yan qulixkarêd din destpêkirin dannasîn kin pêşiya hatina li ser civata seva dannasînkirinê, hingê ewana wê wedê seva qulixkirinê zef unda nekin.

3 Civatêd seva dannasînkirinê gerekê usa bêne sazkirinê, wekî qulixkarara alîkariya mezin bide. Gelek civat safî kirin derbaz kin civatêd seva dannasînkirinê li ciyê başqe bi komêd biçûk, ne ku gişk tevayî di avayîkîda. Ev yek alîkariyê dide qulixkara wekî hêsa bigihîjne li ciyê civatêd seva dannasînkirinê û têrîtoriya xwe. Ev yek ne ku tenê alî qulixkara dike wekî zû şixulêd xwe safî kin lê usa jî alî berpirsiyarêd komê dike wekî rind dîna xwe bidine hewcêd xûşk-birêd koma xwe. Koma rûspiya dikare dîna xwe bide hewcêd mihala xwe û safî ke çi wê baş be. Heta ku bi duakirina kin civatê xilaz kî, hemûşk gerekê bizanibin wekî ewana diçine kîderê û tevî kê herin li dannasînkirinê.

4 **Civatêd Dannasînkirinê Anegorî Civatêd din, Gelek Ferz in:** Rast e civatêd seva dannasînkirinê saz kirine seva ku karê bidine qulixkara, lê ser wana temamiya civatê nayê. Çi jî hebe ev nayê hesabê ku em gerekê hindava wê yekê bêtalaş bin yan jî hesab kin ku ew ne jî usa ferz in. Anegorî hemû civatêd meye din, civatêd seva dannasînkirinê dayîna ji Yahowa ne, ku alî me dike wekî hizkirinêda û qencîkirinêda hêlana bidine hev (Îbrn. 10:24, 25). Xêncî wê yekê birê ku evê civatê derbaz dike, gerekê rind hazirkirî be ku şêwirkirina wî Yahowa rûmet ke û karê bide xûşk-bira. Lema jî qulixkarêd ku derdikevin li dannasînkirinê, gerekê qewatê bidine xebatê ku bêne li ser civatê seva dannasînkirinê.

5 **Hazirbûna Birêd Cabdar:** Seva ku kesek rind hazirkirî be seva civatê, ew gerekê pêşda

1. Mena civatêd seva dannasînkirinê çida ne?
2. Civata seva dannasînkirinê çiqas wede gerekê bikişîne?
3. Çawa civatêd seva dannasînkirinê dikarin saz kin, wekî qulixkarara alîkariya mezin bide?
4. Çira em gerekê hindava civatêd seva dannasînkirinê bêtalaş nîbin û hesab nekin wekî ew ne jî usa ferz in?
5. a) Çidane rola berpirsiyarê xizmetiyê hindava derbazkirina civatêd seva dannasînkirinê? b) Çawa xûşk gerekê derbaz ke civata seva dannasînkirinê?

derza xwe bistîne. Ewê yekê em dikarin bêjin derheqa civatêd seva dannasînkirinê jî. Hemikî çaxê komeke dannasînkirinê başiqe top dibe, hingê berpirsiyarê komê yan alîkarçiyê wî, gerekê seva koma xwe ewê civatê derbaz kin. Lê çaxê komêd seva dannasînkirinê tevayî top dibin li ser vê civatê, wî çaxî berpirsiyarê xizmetiyê wê kesekî kifş ke seva ku civata dannasînkirinê derbaz ke. Hine berpirsiyarêd xizmetiyê, navnîşê dêmek girafîkê didine hemû birêd cabdar, û kopya vê girafîkê ser textê elametiyê darda dikin. Berpirsiyarê xizmetiyê gerekê serwaxt bin çaxê kifş dikin birêd ku civata dannasînkirinê derbaz kin. Berpirsiyar usa jî gerekê bîra xweda xwey kin, wekî derbazkirina rind ya vê civatê girêdayî ye tevî feresetêd hînkirinê û terbetiya wî birayî ku derbaz dike. Hergê di wan rojada ne rûspî, ne berdestiyê civatê û ne jî birêd dine cêribandî nikarin ewê civatê derbaz kin, hingê berpirsiyarê xizmetiyê gerekê kifş ke xûşka nixumandî û cêribandî, seva ku civatê derbaz ke. (Binihêre gotarê "Kengê Xûşk Gerekê Derbaz ke").

Em gerekê hesab nekin ku civatêd seva dannasînkirinê, ji civatêd dinêna gelek ferz nînin

6 Çaxê em di Mekteba Dannasînkirinêda yan jî Civata Qulixiyêda derza distînin, bê şik em ewê yekê hildidin hesab û rind hazir dibin. Lê tenê hineka ji me destpêdikin hingê hazir kin derza xwe û dişirmîş bin, kengê rêda nin û diçine civatê. Anegorî wê yekê çaxê bira kifş dikin ku ew derbaz ke civata dannasînkirinê, ew gerekê ewê yekê hilde hesab û pêşda rind hazir be. Niha ji bo wê yekê ku wedê civata dannasînkirinê wê kêm be, gele ferz e rind hazir bin, seva ku kêrhatî derbaz be û wedê xweda xilaz be. Nava hazirbûnê usa jî dikeve, wekî *pêşda* têrîtoriya dannasînkirinê xwera hildin.

7 **Çi Şêwir Bikin:** Rast e têrîtoriyek ji yê din cude dibe, lema jî xulamê amin seva her civata dannasînkirinê bernamê hazir nake ku çi şêwir bikin. Ew çargoşe "Wedê Civata Dannasînkirinê, Dikarî Şêwir Bikî", dide kifşê ku çi dikarin şêwir bikin. Bi temamî, civata dannasînkirinê wê bi şêwirkirinê derbaz be. Hergê dest dide dikarî nava wê şêwirkirinêda temaşa rind hazirikirî nîşan kî, yan vîdêoye ji jw.org. Çaxê bira hazir dibe derbaz ke civata dannasînkirinê, wî çaxî ew gerekê dişirmîş be hela wê çi xûşk-bira hêlan ke û alîkariyê bide wan wedê dannasînkirinê.

8 Rojêd Şemiya heçî zef ji xûşk-bira bela dikin "Birca Qerewiliyê" û "Hişyar Bin!". Gelek xûşk-bira tenê rojêd Şemiya dikarin qulix kin, lema jî diqewime wanara wê çetin be bîra xweda xwey kin pêşanînêd ku wana li ser Qulixkirina xweye Tevî Malbetê hazir kirine. Lema jî dikare kêrhatî be wekî birê ku civata dannasînkirinê derbaz dike, şêwir bike derheqa cûrek ji pêşanînê ya ku li ser rûpêla paşin e ji "Qulixkirina Meye Padşatiyê". Usa jî bira dikare şêwir bike, wekî çi cûreyî dikarin deng û besê teze, qewimandinêd mihalê yan cejina, tevî pêşanîna xwe girêdin ku bikaribin paşê serlêdanê bikin û wekî xweyê malê jî jûrnalê qebûl ke. Hergê hinek ji hazira îda dane xebatê ew jûrnal seva belakirinê, hingê birê ku derbaz dike gerekê bêje ku ewana kin nihêrandina xwe bêjin seva wê yekê yan qewimandinêd baş gilî kin. Roja Leda jî birê ku civatê derbaz dike gerekê anegorî wê yekê bike. Ew edebyetêd seva hînbûnê "Mizgîniya Xwedê seva Meriya", "Guh Bide Xwedê", û kitêba "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?" em dikarin her roj bela kin. Lema jî li ser civata dannasînkirinê, ewêd ku civatê derbaz dikin, dikarin kin şêwir bikin, wekî çawa yek ji wan edebyeta bela kin.

9 Hergê Şemî Leda civat di kampanîa mexsûsda kar dike, hingê bira dikare şêwir bike wekî ça belakin jûrnalêd teze tevî teglîf kirinê yan jî belavoka. Yan jî ew dikare şewir

6. Çira ferz e wekî birê ku civata dannasînkirinê derbaz dike, rind xwe hazir ke?

7. Derheqa çi gerekê şêwir bike birê ku civata dannasînkirinê derbaz dike?

8. Li ser civata dannasînkirinê rojêd Şemiya û Leda çi wê kêrhatî be ku şêwir kin?

9. Derheqa çi bira dikare şêwir bike, hergê Şemî Leda civat di kampaniya mexsûsda kar dike?

bike ku çi gerekê bikin hergê xweyê malê hewasa xwe da kifşê. Xêncî wê yekê ser wê civatê xûşk-bira dikarin hine qewimandina gilî kin, yêd ku qîmeta wan kampaniya didine kifşê.

10 **Hazirbûna Qulixkara:** Qulixkar jî dikarin di vê yekêda kar bikin, dêmek tiştekî bikin ku ew civat kêrhatî be. Çaxê ewana pêşda seva dannasînkirinê xwe hazir dikin wedê qulixkirina xweye tevî malbetê, hingê bal wana wê hebe wekî çi qulixkarêd dinênara gilî kin. Nava hazirbûna başda usa jî dikeve, çaxê qulixkar *pêşiya* hatina li ser civata dannasînkirinê pêşda hazir dike ew jûrnal û edebyeta, kîjana ku ewê bide xebatê. Çimkî bi saya wê yekê her kes wê bikaribe bê eglekirin ji odê derkeve û here dannasînkirinê.

Çaxê birê cabdar seva civata dannasînkirinê xwe hazir dike, ew gerekê dişirmîş be hela wê çi hêlan ke xûşk-bira û alîkariyê bide wan, wedê dannasînkirinê

11 Usa jî gelek ferz e wekî xwera bikine xeyset hinek zû bêne li ser civata dannasînkirinê. Hilbet em wedê xweda têne li ser hemû civata. Xêncî wê yekê çaxê em derengî dikevin li ser civata dannasînkirinê, ew yek dikare hine çetinaya çêke. Çi cûreyî? Birê ku civatê derbaz dike, rêberiyê hildide destê xwe ku hilde hesab hine tişta, pêşiya ku komê saz ke. Hergê gelek qulikar nehatine li ser vê civatê, hingê bira dikare her kesa ji wan bişîne li ser têrîtoriya ku bi temamî nehatiya xebitandinê. Hergê hineka ji riya dûr têne li ser civata dannasînkirinê û diçine dûr li ser têrîtoriyê, hingê bira dikare ewan qulixkara verêke tevî wan kê pê avtê ye. Usa jî hergê xûşk diçine li ser têrîtoriya xof kîderê ku zulmî diqewimin, hingê birê cabdar dikare bira tevî wan kifş ke yan wana bişîne ku nêzîkî wî cî bin kîderê ku koma xûşka dannasîn dike. Qulixkarêd sihet-qewata kîjana ku sist e, bira dişînin li wan ciya kîderê ku riya baş e, yan jî li wan avaya kîderê ku hine qet hene. Qulixkarêd teze jî, bira kifş dike tevî wan yêd ku cêribandî ne. Lê çaxê qulixkar derengî dikevin li ser civata dannasînkirinê, hingê birara lazim e hemû tişt tezeda safî ke wekî alî wan bike yêd ku derengî ketine. Tebyetiye wekî carna cem me dikarin meniyêd ferz hebin seva çi jî em derengî dikevin. Lê hergê ew mera bûye xeyset, em dikarin ji xwe bipirsin: "Dibeke ez derengî dikevim ji bo wê yekê ku dişirmîş dibim wekî civata dannasînkirinê ne jî usa ferz e. Yan jî diqewime ez pêşda xwe hazir nakim, seva ku bême ser civata dannasînkirinê".

12 Qulixkarêd ku têne li ser civata dannasînkirinê, dikarin xwexa pêşiya destpêkirina civatê hevra xeber din ku wê tevî kê derkevin û kuda herin. Hergê gelek car tu xwexa heval-xizmetkar xwera dijbêrî, dikarî dişirmîş bî wekî hinek di qulixkirinêda "fire bî". Dêmek dewsa ku her car tevî hevalêd xweye nêzîk dannasîn bikî, dikarî tevî cûre-cûre qulixkara şixulkarî bikî (2 Korn. 6:11-13). Tu dikarî car-cara tevî qulixkarêd teze dannasîn bikî, ku alî wan bikî feresetêd xweye hînkirinê baş kin? (1 Korn. 10:24; 1 Tîmt. 4:13, 15). Rind guh bide wan rêberiya ku tera didin, usa jî ewan rêberiya wekî kîderê gerekê destpêkî dannasîn bikî. Çaxê civat xilaz dibe, pilanêd ku hatine safîkirinê neguhêze û bê eglekirin derkeve û here li dannasînkirinê.

13 Paşê dannasînkirinê, 70 şagirtêd Îsa kîjana ku ewî şandibû, "bi eşq û şa vegeriyan" (Lûqa 10:17). Bê şik Îsa tevî şagirtêd xwe top bû pêşiya derketina wan li dannasînkirinê, û alî wan kir ku serfiraz bin. Roja îroyîn jî nêta civatêd dannasînkirinê wê yekêda ne, wekî karê bistînin û serfiraz bin. Hergê her kes bi xîret ewê yekê dike çi ku ji wan tê xwestinê, hingê civatêd seva dannasînkirinê wê me hêlan kin, hazir kin û alî me bikin biqedînin ew şixulê xwe ku "hemû miletara" şedetiyê bidin (Met. 24:14).

10, 11. Çira hazirbûna qulixkara ferz e, seva ku civata dannasînkirinê kêrhatî be?

12. Çi tu gerekê hildî hesab çaxê xwexa safî dikî tevî kê herî dannasînkirinê?

13. Hergê her kes bi xîret bike ewê yekê çi ku ji wî tê xwestinê, hingê çawa civatêd seva dannasînkirinê wê bona me kêrhatî bin?

Kengê Xûşk Gerekê Derbaz ke

Xûşk gerekê serê xwe girêde, rûnê û usa civatê derbaz ke. Ew çi ku ewê şêwir bike, anegorî wê yekê be derheqa çi jî wê bira şêwir bikira. Dewsa ku şîreta bide guhdara, ew gerekê tevî komê şêwir bike. Hergê ew xûşk, xûşkeke dinê teglîf dike ku dua bike, ew jî gerekê serê xwe girêde. Hergê xûşkê civat destpêkir, û hine wededa birê nixumandî tê, hingê xûşk gerekê wî teglîf ke ku ew civatê berdewan ke û xilaz ke. Berpirsiyarê xizmetiyê gerekê hîviya derecêd usa be û rêberiya lazim bide, ku derecêd usa hindik bin. Mesele birê gelek cahil, diqewime neghîştî û nixumandî tê li ser wê civatê çaxê xûşk derbaz dike, lê rûspî hesab dikin ku ew bira hela hê cêribandî nîne seva ku ewê civatê derbaz ke. Derecêd usada berpirsiyarê xizmetiyê dikare elam ke wanara yêd ku têne li ser wê civatê wekî xûşk hatiye kifşkirinê seva derbazkirina wê civatê. Lê paşê bira gerekê dua bike, hergê rûspî dişirmîş dibin ku ew seva wê yekê cêribandî ye. Yan jî diqewime wekî li ser vê civatê birê gihîştî hazir e, yê ku ji bo hine meniya, derheqa kîjana ku rûspî zanin, ew nikare civatê derbaz ke yan dua bike. Bira, xûşkêra evan meniya eyan nake, lê pêşda wêra dibêje ku hergê ew bira jî hazir e, yeke ew xûşk gerekê civatê derbaz ke û dua jî bike. Rûspî dikarin usa jî bêjin wî birayîra wekî kîjan roja ew xûşk wê civata dannasînkirinê derbaz ke.

Wedê Civata Dannasînkirinê, Dikarî Şêwir Bikî:

- Cûrek ji pêşanînê ji "Qulixkirina Meye Padşatiyê".
- Vîdêoyek derheqa qulixkirinê ji jw.org.
- Hine tiştêd ku dikevine nava pêşanîna baş. Mesele pêşxebera me, çêkirina hîm seva serlêdana dubare yan jî çaxê edebyetêd me hildidin çawa em dikarin dîna wan bidin li ser qurbankirina pera ku wê yekêva girêdayî ne.
- Rêzêd hêlankirinê yan hînkirinê, yêd ku qulixkirinêva girêdayî ne.
- Qewimandinêd wedê dannasînkirinê, ku hatine neşir kirinê yan jî mihalêda qewimîne.
- Elametî ji gotarê ya "Qulixkirina Meye Padşatiyê".
- Elametiya ji pareke Civata Qulixiyê ku derbaz bûye.
- Elametiya derheqa dannasînkirinê ji "Birca Qerewiliyê".
- Elametiya derheqa dannasînkirinê ji edebyetêd usa, ça "Mekteba Dannasînkirinê" û "Pey Min Werê".
- Tiştekî ji jw.org yêd ku qulixkirinêda dikarin bidine xebatê.
- "Welgerandina Dinya Teze" ya tezekirî, ku em dikarin li dannasînkirinêda bidine xebatê.
- Çawa destpêkin xeberdanê çaxê di mihala xweda rastî atêîsta, êvolûsîonîsta, Îndûsa û Bûdîsta tên.
- Çawa caba wan bidin, yêd ku xeberdana me dibirin.
- Çawa dikarin alî heval-xizmetkarê xwe bikin, seva ku dannasînkirina wî ber derî hê kêrhatî be.
- Çawa caba wan bidin, yêd ku li ser zimanê din xeber didin.
- Çawa şedetiyê bidin cûrêd dannasînkirina usada, mesele bi têlê, li ciyêd ku gelek meriv top dibin, wedê serlêdanêd dubare, yan jî hînkirina Kitêba Pîroz.
- Bîra xweda xwey kin rêberiyê derheqa bêxofiyê, merîfetî, rabûnrûniştandina baş, nihêrandina pozîtîv û tiştêd vî cûreyî.

HEFTIYA JI 30 ADARÊ

Kilama 47 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
fg Serê 1 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 1 Samûyêl 14-15 (8 deqe)
№ 1: 1 Samûyêl 14:36-45 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Serhatî 99 (*my*)
№ 3: Pêxembertiya ji Kitêba Pîroz Derheqa Rojêd Me, ya ku tê Sêrî (*igw* rûp. 13 abz. 1) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 37
15 deqe: Vîdêoya Teze li ser Malpera Me seva Qulixkirinê. Şêwirkirin. Destpêke pê nîşankirina vîdêoyê "Ça Derbaz Dibe Hînbûna Kitêba Pîroz?". Paşê şêwir ke ku çawa evê vîdêoyê di dannasînkirinêda bidine xebatê. Usa jî nîşan ke vîdêo "Çi Diqewime Oda Civatêda?" û paşê şêwir ke ku çawa ewê vîdêoyê di dannasînkirinêda bidine xebatê. Temaşekê nîşan ke.
15 deqe: Xebitandina Broşûrê "Çi Em Dikarin Hîn Bin ji Xebera Xwedê"; Destpêkirina Xeberdanê. Pirs û cab. Teglîf ke guhdara bira bêjin ku çawa ewana dikarin broşûra "Çi Em Dikarin Hîn Bin Ji Xebera Xwedê" di dannasînkirinêda bidine xebatê. Temaşekê nîşan ke.
Kilama 47 û Duakirin

Xebitandina Broşûrê "Çi Em Dikarin Hîn Bin ji Xebera Xwedê"; Destpêkirina Xeberdanê

1 Ça em dikarin evê haceta teze bidine xebatê, çaxê bona dannasînkirinê pêşanînê hazir dikin? Di van her têma Kitêba Pîrozda rêz hene, çawa di kitêba "Şêwirkirinêda" heye û ew dikare gelek kêrhatî be wekî xeberdanê destpêkin.

2 Mesele tu dikarî bidî xebatê pirsa 8 û bêjî: "Em îro têne bal meriya, çimkî gelek meriv dişirmîş dibin, 'Gelo Xwedê ye neheq ku meriv diçerçirin?' [Di hine têrîtoriyada hê baş e wekî xweyê malêra pirsê *nîşan kî.*] Lê hûn ça dişirmîş dibin? [Hîviyê be bira caba xwe bide.] Kitêba Pîroz caba wê pirsê dide". Bixûne û şêwir ke yek yan hê zêde rêz ji Kitêba Pîroz ji wê têmê. Hergê xweyê malê hewasa xwe dide kifşê, tu dikarî wîra pirsa 20 vekî û nîşan kî pirsêd ku wêderê hene, û bira bijbêre pirsek, wekî wedê serlêdana dubare tu tevî wî şêwir kî. Yan jî dikarî bidî edebyeta bona hînbûnê kîderê ku hê zêde înformasya heye derheqa wê tême, ya ku we şêwir kiriye.

3 Pirsêd 4 û 13 heta 17, dikarin gelek kêrhatî bin çaxê dannasîn dikin di wan mihalada kîderê ku rêlîgiya meriya, ne ya mesîhtî ye. Mesele, tu dikarî bidî xebatê înformasya ji pirsa 17 û bêjî: "Em îro xeber didin tevî malbeta. Dixwazin ji we pirs kin, hûn qayîl in ku malbet îro rastî gelek çetinaya tê? [Hîviyê be bira caba xwe bide.] Seva gelek cotêd zewicî evan giliyê han gelek kêrhatî bûn: "Jin ji mêrê xwe xof bike [qedir bigire, *DT*]" [Eseyî nîne evan giliya ji Efesî 5:33 nîşan kî. Hergê tu tevî kulfetê xeber didî tu dikarî bi ezberî bêjî giliyê ji Efesî 5:28.] Ça hûn dişirmîş dibin, xebitandina ewê şîretê dikare kêrhatî be bona zewacê?"

4 Xilaziya xeberdana xwe, hîm dayne seva ku careke din şêwirkirinê berdewan kî. Tu dikarî safî kî wekî xeberdî derheqa rêzêd din, ji wê pirsê ku te daye xebatê. Wedê xweda xweyê malêra bide kifşê ku ew xeberêd bîlan, kîjanî te wîra gilî kir, ji Kitêba Pîroz in. Li ser hîmê şêwirkirina xwe tevî merivî û li ser hîmê nihêrandina wî derheqa Kitêba Pîroz, dikarî ewê edebyetê wîra bihêlî, ya ku bi dişirmîşbûna te seva wî lazim be. (Binihêre "Qulixikirina Meye Padşatiyê" ya meha Kanûna Pêşin, sala 2013 (ru).)

1. Kîjan haceta teze bona dannasînkirinê, me sitand?
2. Ça em dikarin di dannasînkirinêda broşûra "Çi Em Dikarin Hîn Bin ji Xebera Xwedê", bidine xebatê?
3. Em ça dikarin bidine xebatê broşûra "Çi Em Dikarin Hîn Bin ji Xebera Xwedê", seva ku destpêkin xeberdanê tevî wan meriya, rêlîgiya kîjana ku ne ya mesîhtî ye?
4. Tu çi dikarî bikî xilaziya xeberdana xwe, çaxê xeber didî tevî merivî ku di rêlîgiya mesîhtîda nîne?

HEFTIYA JI 6 NÎSANÊ

Kilama 22 û Duakirin

❑ **Hînbûna Kitêba Pîroz di Civatêda:**
fg Serê 2 (30 deqe)

❑ **Mekteba Dannasînkirinê:**
Xwendina Kitêba Pîroz: 1 Samûyêl 16-18 (8 deqe)
№ 1: 1 Samûyêl 18:17-24 (3 deqe yan hê kêm)
№ 2: Gelo Xwedê ye Neheq ku Merî Diçerçirin? (*igw* rûp. 14 abz. 1-4) (5 deqe)
№ 3: Çi tê Hesabê Kutasî, Dêmek "Axiriya Dinyayê" (*td* 23A) (5 deqe)

❑ **Civata Qulixiyê:**
Kilama 26
10 deqe: Belakirina Jûrnala Meha Nîsanêda. Şêwirkirin. Gotarê destpêke pê temaşê û nîşan ke ku ça jûrnala bela kin û bide xebatê pêşanînêd ku hatine dayînê. Paşê, her pêşanînek ji serî heta xilaziyê şêwir ke.
10 deqe: Ça Me Ew Yek Da Xebatê? Şêwirkirin. Teglîf ke guhdara wekî caba xwe bidin ku ça wana daye xebatê wan şîreta ji rêza gotara "Hîn be wekî di Qulixkirinêda Hê Cêribandî bî; Bixebite ku Dayîna Jûrnala Kêrhatî be". Bêje guhdara bira qewimandinêd hewas gilî kin.
10 deqe: Hewcêd civatê.
Kilama 27 û Duakirin

Elametî

■ Edebyetêd bona belakirina seva meha **Adar û Nîsanê:** "Serhatiyêd Kitêba Pîroz". **Gulan û Hezîran:** "Çi Hîn Dike Kitêba Pîroz?" yan jî yek ji van belavoka: "Çi Hûn Derheqa Kitêba Pîroz Dişirmîş Dibin?", "Halê Dinyayê wê Çawa be?", "Çi Lazim e, seva ku Malbet Bextewar be?", "Kî bi Rastiyê li ser Dinyayê Hukum Dike?", "Gelo wê bê ew Wede, Çaxê Kul-Derd Îda Tune bin?", yan jî "Gelo bi Rastiyê Mirî Dikarin Dîsa Bijîn?".

■ Êvara Bîranînê ya sala 2015, wê roja Înîyê, 3 Nîsanê derbaz be. Çaxê roja Înîyê civata we derbaz dibe, hingê ev civat gerekê heftiya dinda derbaz kin, hergê Oda Civatê vala ye. Hergê Civata Qulixiyê wê derbaz nabe, hingê koordînatorê koma rûspiya dikare hine guhastina bike di bernamêda, wekî ew parêd ku bona civatê gelek lazim in, nava vê mehêda bêne şêwirkirinê.

Cûrek ji Pêşanînê

BIRCA QEREWILIYÊ® 1 Nîsanê
DERHEQA PADŞATÎYA YAHOWA ELAM DIKE

"Îro evê belavokê em hemûyara bela dikin. [Xweyê malêra bide belavoka "Çi Hûn Derheqa Kitêba Pîroz Dişirmîş Dibin?", û van pirsa bide wî yêd ku li ser rûpêla pêşin in. Dîna meriv bide li ser caba Kitêba Pîroz ji 2 Tîmotêyo 3:16, û hêlan ke wekî evê belavokê bixûne, çaxê wedê wî wê hebe.] Gelek meriv haşpê tune ne, wekî Kitêba Pîroz caba wan pirsa dide, mesele . . . . [Dîna xweyê malê bide li ser pirsêd sereke, yêd ku di gotara pêşinda nin di "Birca Qerewiliyêda".] Di vê jûrnalêda tê şirowekirinê, wekî ça em dikarin caba pirsêd xwe di Kitêba Pîrozda bivînin".

Hişyar Bin!® Nîsan

"Îro gelek meriv berxwedikevin ji bo wan guhastina, yêd ku ewana di malbetada divînin. Mesele berê, dê û bav rêberiya zarêd xwe dikirin û wana hîn dikirin, lê niha di hine malbetada zar evê yekê hildidine destê xwe. Ça hûn dişirmîş dibin îro dê-bav zarêd xwe usa şîret dikin, çawa ku gerekê bibe? [Hîviyê be bira caba xwe bide.] Kitêba Pîroz dibêje, wekî şîretkirina zara gelek ferz e. [Bixûne Metelok 29:17.] Di vê jûrnalêda tê şêwirkirinê derheqa van rêberiya ji Kitêba Pîroz, yêd ku alîkariyê didin seva şîretkirina zara".

Pêşdaçûyîn di Qulixkirinêda

Em şa ne elamî we bikin ku 945 pêşeng hazir bûn li ser bernama teze ye "Mekteba seva Pêşenga" di Gurcistanêda wedê meha Îlonê, Cotmehê û Teşrînê di sala 2014-da. Tu dikarî bikevî nava rêza wan meriya? (Zeb. 96:2).

km15 03-RDU Ga 141203